BANGA GIŞTÎ

**Kumaşa xwe û çîroka xwe li gel xwe bîne.**

**Çalakiyeke hevpar a hunerî bi tekstîlê li Kilîse Melanchthon a Essenê**

**Di çarçoveya Manifesta 16 Ruhr de**

**25ê Tebaxê – 15ê Îlonê 2026**

## Ev proje derbarê çi de ye?

Ger em kilîsekê bi çîrokên *cînari*ye xemilînin, çi dê bibe?

Ji bo projeya **"Parçeya ku cîranî ji wê pêk tê"**, em hemû kesên ku li Essen û derdora wê dijîn vedixwînin ku bibin beşek ji projeyeke hunerî ya hevpar.

Em bi hev re parçeyan kom dikin, çîrokan vedibêjin, li ser parçeyan dinivîsin, wan dixemilînin û bi hev re didirin. Di dawiyê de, ev parçeyên dê bibin berhemeke hunerî ya mezin ku li ser rûyê derve yê kilîsa Melanchthon were danîn.

Gelek kumaş tenê materyal nînin. Ew bîranîna rêwîtiyekê, xaniyekê, xatirxwastinekê, zaroktiyekê, malbatekê an destpêkeke nû vedigerînin. Bi taybetî di çîrokên koçberiyê de, kumaş gelek caran dibin arşîvên bîranînê, windabûnê, parastinê û hêviyê.

## Tu dikarî çi bînî?

- Cilêk, perdeyek, betaniyek, perçeyek kumaşê, şalek, masepûşek an her tekstîlek ku ji bo te wateyek taybet heye.
- An jî tenê kumaşek ku tu hez jê dikî û bedew dibînî.

## Dem:

Ji **25ê Tebaxê heta 15ê Îlonê**, her roj di navbera seat **10:00–17:00** de em ê van kumaşan bi hev re bidozin û bikin parçeyên mezin. Ji gelek perçeyên biçûk berhemeke hunerî ya hevpar çêdibe — tevnek ji bîranîn, ezmûn û hevdîtinan.

Kumaşên hatine dozkirin di roja dawî ya çalakiyê de li ser rûyê Kilîse Melanchthon dê werin danîn û heta dawiya **Manifesta 16 Ruhr** dê ji aliyê mêvanan ve bên dîtin.

## Atolyeyên Hevpar

**Ziman di Cihê Giştî de**

**Atolyeya pankartan bi hunermenda Maria Renee Morales Garcias re**

**3ê Îlonê | 10:00–17:00**

Dema em dixwazin bên dîtin û dengê me were bihîstin, em li ser pankartekê çi dinivîsin?

Di vê atolyeyê de, bi destpêkirina dîroka pankart û afîşên tevgerên protestoyê, em ê li kumaşê wekî hilgirê peyaman, daxwazan û hevgirtiyê binêrin. Bi hev re em ê slogan û nivîsan biafirînin ku bibin beşek ji vê berhema hunerî û li cihê giştî xuya bibin.

## Kumaş Çi dibêje?

**Atolyeya nivîsandinê bi nivîskar Esra Canpalat re**

**4ê Îlonê | 10:00–17:00**

Kumaşek kîjan bîranîn, çîrok û ezmûnan di xwe de digire?

Di vê atolyeya nivîsandinê de em ê bi rêya nivîsên kesane li ser mijarên koka çandî, koçberî, destpêkên nû, xatirxwastin, cîranî û hesta girêdanê bi hev re bifikirin. Peyv, hevok û beşên ku ji van nivîsan tên hilbijartin, paşê dê li ser kumaşan werin nivîsandin û bibin beşek ji tevna hevpar.

Çalakiya dozandinê û hemû atolyeyan ji bo kesên her temenî û her asta ezmûnê vekirî ne.

**Beşdarbûna di çalakiya dozandinê de azad e. Tu dikarî tenê rojekê, çend saetan an jî di dirêjahiya tevahiya çalakiyê de çend caran beşdar bibî.**

Em bi xêrhatina hemû kesên ku dixwazin di atmosfera rêzgirtin, hevkariyê û rêzdariya hevdu de beşdar bibin pêşwazî dikin.

Kesên bin 18 salî dikarin bi rêhevaltiya dêûbav an berpirsiyarê xwe yê qanûnî beşdar bibin.

Ji bo beşdarbûnê zanîna berê ya dirûnê gerek nake.

## Cih û Dem?

**Kilîse Melanchthon**
Melanchthonkirche – Ev. Erlöserkirchengemeinde Holsterhausen
Melanchthonstraße 3
45147 Essen

## Dem?

**25ê Tebaxê – 15ê Îlonê 2026**

Duşem heta Înê | Her roj **10:00–17:00**

## Rêveberiya Projeyê

Negar Foroughanfar
Farnaz Shahriari

**Tomarkirin ji bo çalakiya dirûnê û çalakiyên hunerê**

**stoff-projekt@proton.me**